**Girê Keşkeşûk**

Girê keşkeşûk di nava herêmên Xabûr dikeve. Û nêzî newala Elewec e. Ev gir bi 18 km dûrî bajarê Hesekê ye ji aliyê bakurê rojhilat û dûrî bajarê Qamişlo 68 km ji aliyê başûrê rojava ve.

Girê keşkeşûk ji gund û niştecihên çandiniyê yên yekemîn ên ku ji herêma Xabûr hatin der, her wiha ev cih ji cihên bakurî Mezopotamyayê ên berdewamiya niştecihbûnê di nava qonaxekê de ku ji nîvê hezarsala 7an ta dawiya hezarsala 3 an b.z; tê dîtin.

Ev cih ji çar giran pêk tê. yek jê  li ser rexê rastê ji newal Riclê ya ku ji çemên rûbarê Elerec in; dikeve. Lê girên din li aliyê çepê ji vê newalê ne.

Girê duyemîn bi rûberek dighêje 8 000 $m^2$; saz dibe û ji deşta derdorê bi 4 m bilindtir e

---

Lêkolîn: lêkolîn li vî cihî di nava salên 1987-1988z li ser destê şandeya Japonî- Sûrî ya hevpar bi rêveberiya Yoşîhîro Nîşîyakî (Yoshihiri Nishiaki) û Entwan Silêman; dest pê kirin.

---

Xilikek ji girê Keşkeşûkê ku vedigere qonaxa Helef (5500-4300) b.z

Parçeyek ji xilikekê ji Girê Keşkeşûkê ku vedigere serdema kevirîn a nû.